B. FILAD - *Üç ciltlik Horasan Kürt Hareketi Tarihi'nden başka çalışmalarınız var mı?*

K. TEWEHURİ - Evet, bura Kürtleri tarihinin karanlıkta kalan sayfalarını aydınlığa çıkarmak için yazılan *Horasan Kürt Hareketi Tarihi* kitabının altıncı cildi de var. Horasan tarihi, yani Kürt tarihinden başka edebi, kültürel, hümaniter ve sanata ilişkin olmak üzere 24 adet kitabım var. Ancak parasızlık yüzünden şimdiye kadar bastırma olanağı bulamadım.

Bu son zamanlarda alabildiğim bir yardım sayesinde irfan şairimiz *Cafer Kuli Han Zengoli*'nin divanını baskıya verdim ve yakında okuyucuların eline geçeceğini sanıyorum. Bununla birlikte *Horasan Kürt Tarihi*'nin 1. ve 4. ciltlerini IBM'le yazdım ve umarım yakın bir gelecekte ya da bu yıl okuyucuların eline geçer. Ömrüm yeterse, yazmış olduğum *Kurmanc Atasözleri*'ni Kürtçe ve Farsça olarak Latin alfabesiyle yayımlamayı düşünüyorum. *Horasan Kürt Hareketi Tarihi*'nin üçüncü cildinin sonunda görül - düğü gibi Kürtçe bir sözlük de (ferheng) hazırlamış bulunuyorum.

Bunlardan başka Farsça dergi ve gazetelerde değişik birçok makalem yayımlandı. Örneğin *Sanat Dergisi (Fesilnameyê Huner)*'nin 13. sayısında *Mırgan der Ferhengê Kurmanci* başlığı altında, *Aşiret Dergisi (Fesilnameyê Eşair)*'nin 4. sayısında *Deger Guni Mewaqe E'şayiri Kurdê Xorasan der Çehar Salê Axır* adı altında yazılarım yayımlandı.

B.FILAD - *Kitabınızın üçüncü cildinde Halk(Gel) gazetesini de anmışsınız. Ancak "Suriye Kürt Demokrat Partisi Organı" diye belirtmişsiniz. Bilindiği bu (onun değil) bizim partimizin, yani Kürdistan Demokratik Halk Partisi'nin merkez yayın organıdır. Peki bu nasıl oldu ve nasıl elinize geçti?*

K. TEWEHURİ - Malum Kürtlere ilişkin her türlü yayının peşinde koşuyorum. O gazeteyi de arkadaşlarım bana gönderdiler. Pakistan Kürtleriyle ilgili bir yazının onda yayımlandığını öğrenmiştim. Fakat Arapça bilmediğim için Meşhed'de kalan Irak Kürtlerinden olan bir arkadaştan, Farsça'ya çevirmesini rica ettim. İsteneni yaptı, kendisine müteşekkirim. Belli ki bu yanlış çeviriden kay-

naklanmış ve benim bunda bir kusurum yok. Yine de özür dilerim.

B. FILAD - *Biz Pêşeng ve Gel gazetesi aracılığıyla ülkesinden kopan ve mülteci durumunda bulunan Kürtler hakkında bilgi elde edip duyurmaya çalıştık. Bu konuda bize ne önerirsiniz?*

K. TEWEHURİ - Doğrusu bu her bakımdan yerinde ve yararlı bir uğraş. Tarih boyunca Kürtler daima göçettirilmiş, yer değiştirilmiş ve sürgün edilmişler. Uzak ya da yakın yerlere göçettirilmişler... Şimdi Pakistan, Afganistan, Hindistan ve çeşitli yerlerde Kürtler yaşıyor. Başka halklarla karışıp giden bu Kürtlerin çoğu kendi ana-dillerini unutmuş ve o halkların dilleriyle konuşurlar. Bunların saptanması, yani yurtlarından kopup şimdiki yerlerde yaşayan bu Kürtlerin tarihinin aydınlatılması toplumbilim bakımından son derece önemli ve yararlı bir iş olur. Umarım bu çabanızı sürdürürsünüz, hiç kuşkusuz bu kut-sal ve dikkate şayan bir uğraştır.

B. FILAD - *Horasan Kürt çocuklarının eğitimi için neler yaptınız ve ne yapmayı düşünüyorsunuz?*

K. TEWEHURİ - Çocuk masalları yazıp bu yolla onlara Kürtçe alfabeyi öğretmek için çaba göstermeyi tasarlıyorum. İran Devrimi'nden önce Oğaz köyü okulunda biraz çaba gösterdim. Örneğin Kürt çocukları için Kürt türküleri ve masallar yazıp öğretiyordum. Ardından da yarışmalar düzenleyerek giderek daha çok Kürtçe okuma ve yazmaya ilgi göstermeleri için teşvik ediyordum. Şimdi de fırsatlardan yararlanarak yakınımnda ve uzakta bulunan çocuklara Kürtçe okuma-yazma öğretmeye çalışıyorum. Halihazırda bu mntıkadaki çiftçilerin birçoğu bana Kürtçe mektuplar yazıyor ve kendi aralarında da Kürtçe mektuplaşıyorlar.

B. FILAD - *Duyduğum kadarıyla zatualiniz Horasan Kürt sanat ve musikisiyle çok meşgul oluyor, güzel türküler okuyorsunuz. Bu konuda söylemek istediğiniz bir şey varmı?*

K. TEWEHURİ - Horasan Kürt sanat ve müziği, son derece zengindir, tıpkı bir okyanos gibi dalga dalga ve hareketli. On dört yıl tümüyle Horasan folklorik halk türkülerini derleyip toparalama işiyle uğraşım. Yakınlarda bunların bir kısmı, İran İslam Cumhuriyeti Müşika Merkezi'nin desteği ve İrşad Bakanlığı'nın yardımlarıyla halkın eline geçecek. Horasan Kürtlerinin ezgileri, halkımızın yaşamını yansıtan eşsiz bir ayna gibidir. Bunlar atalarımızın bize bıraktığı değerlerdir. Bu konuda *Kürt Türkülerinin Felsefesi* (Felsefeya Goraniyên Kurdi) adında yakında basılacak olan bir de kitabım var. Örneğin *Ceco Han*, *Aşiretlerin Ahengi* ve *Serdar E'wız* adlı üç türkü *Horasan Kürt Hareketi Tarihi*'nin üçüncü cildinde yayımlandı. Bu son zamanlarda da *Sırüş Dergisi* ezgileri derleme ve yayımlama konusunda hazırlık yapmaktadır.

Araştırma çalışmalarım ve ilgim nedeniyle yıllardan beri birhayli Kürtçe türkü yazdım ve söyledim. Bu türküle rin notaya geçirilmesi başlıca dileğimdir. Böylece kaybol-up gitmekten kurtarılmış olacak. Kürt türkülerinin derle-nip düzene konulmasının kültürümüzün kurtarılması bakımından zorunlu bir iş olduğu kanısındayım.

B. FILAD - *Bize zaman ayırıp sorularımızı yanıtladığı - nız için size çok çok teşekkür ederim. Kürt dili ve kültürü konusunda başka bir diyeceğiniz var mı?*

K. TEWEHURİ - Ezilen halkımızın kültürüne hiz-met etmek yolunda çaba gösterdiğiniz için asıl ben size ve Pêşeng dergisine teşekkür etmek isterim. Özellikle siz zah-met edip Horasan'a kadar geldiniz, «Ayaklarınız başımız üstüne! Sizi görüp aydınlandık» derim.

Kürt kültürünün yayılması için çaba gösteren, yazan herkese, her organizasyona müteşekkirim ve kendilerinden övünç duyuyorum. Dileğim Kürt yazarlarının zengin ol-maya ve isim yapmaya değil, Kürt kültür ve edebiyatını her bakımdan geliştirmeye önem vermeleridir.

(Bu yazı, Irak-Kürdistan Demokratik Halk Partisi Merkez Yayın Organı Pêşeng'in, sayı 20, Temmuz 1990 tarihli nüshasından alınmıştır. Aslı Soranca olan bu yazı E.Zozan tarafından Türkçe'ye çevirildi.)

Nivisarên Felsefi - III

FÎLOSOOFÊN FELSEFE YA
XWEZAYÊ

MUSTAFA DÜZGÜN

THALES

Malbata *Thales* ji Thebaiyê hatiye Ioniayê. Ew bi xwe hevdemê *Solon* û *Kroisos* ê hukumdarê Lidayê ye. Li gor vê zaniyariyê divê ku di navbera salên 625-545 ên PZ de jina xwe bîriye seri. Dîbêjun di 585'ê de roj hatiye girtin û ev bûyera bûye sedema şerrawestan a Medan û Lidiyan. *Thales* ev gele mêj de hesêb kiribû û xeber dabû ku di filan sali de dê roj bêgirtin. Her du aliyên şerê, Medan û Lidiyan, ev bûyera mina alameteke nexêriyê şirove kirine û şer dane sekınandin.

Thalesê geometriya Mîsrê gele bi pêşde bîriye. Têoremên nû û tîkuztir pêyda kirine. Her wiha li ser pîrsa pêkhatin û pêydabûn a kainatê ji sekîniye û bi bersiva vê pîrsê ve serê xwe êşandiye. Av wek ewil madeyek zayindar (*arkhe*) û wek prensibek bingehîn pêşkeş kiriyê. Qasi ku *Aristoteles* di *Metafizik* a xwe de dînvise, li gor dinyabîniya *Thalesê* av ji gîş hebûna mêjvetir e û ev hebûnên cîhe cîhe yê kînatê ji wê pêyda bûne. Ev dînya ku ji avê pêyda bûye û berhemek avê ye, mina sîniyek pan û berin li ser avê ciwar bûye û digere.

Wek dîxûye, tîbîniyên *Thalesê* hin ji mitolojiya kevnare û ditunên kevn rîzgar nebûne, hin ji rêveva berê neqetîne. Lê giringi ne di vê rûyê xebata wi de ye, giringi her di rêbaz û rewşa wi bi xwe de ye. *Okeanos* bi xwe av e û di mitolojiya kevnare de wek *Dê û bavê Xwedan ên Yewnanê* dihate nasin. Her di tîbîniya *Thales* de ji ew mina mana xwe ya berê hatiye pêşkeş kirin. Li gel vê yekê wi, av wek tîştêk *xwedêyi* an xwedi xîasiyet û taybetiyên Xwedê daye xûyandinê. Her wiha tîştêki zayindar û efraner e.

Bî van ditunên wi, mîrov dikare *Thales* wek *bavê felsefê* an wek *himdarê felsefê* binase û bîde nasandinê? Tîştên ku wi lêzêde kirine an ji nû ve ava kirine çî ne? Dî vir de divê bi çavek berfireh li prosesa pêkhatin û pêşdeçûna ditunên felsefi binhêrin. Nek tenê nihêrinên wi bigirin berçav û li gor wan bîghên biryarek teng; divê di rewş û mercên wi serdemi de çî tewr û rê û rêbazê wi girtine pêş; bi çî awayi bi meselê ve mijûl bûye, wan ji binrxinin.

Yekem *Thales* her çî di bin tesira mitolojiyê de be ji, bi çav û perspektiva mitolojiyê li dînya û xwezayê (tebiet) nanihêre. Mitoloji di dînya wi de ne wek tîştêk xwedi tesir û rênişander e, tenê di pêkhatina fikrên wi de xwedi rolek taybeti bûye. Ango ew ser bi bir û baweriyên dini û *pivaniyên manewi* nîne, an wek pêyrevek ser bi din û mitolo



Thales, ji Miletosê

giye, xwedi tewrek fanatik nîne û wan bî vi tehri nagire berçav. Bî awaki aqli û azadbiri lî *hebûnê* û pîrsa *pêkhatuna wê* mêze dîke.

Lî gor *Thales*, dînya madi ji aliyê Xwedan ve nehatiye efrandî û ne wek berhemek Xwedêyi ye. Ew her wek *hebûnek* bîngehin heye, bî destê kesek an Xwedê çê *nebûye*, *xwebixwe çêbûye* û *xorayî* ye. Her wîha *Thales* dîsan wê, *mina berhemê* *uştêk pêşkêş* dîke, wek av ji *hebûnek madi* an ji *madeyek zayîndar* *pêyda* dîke.

Thales ku *mina mirovên dini bîfîkraba*, *hest bî pîrsa bîngehin nedîkîr*, *nedîket xema bersiva wî* û lî wê *bersivê nedigeriya*. Jî ber ku dî *mitologiyê* de *bersiva vê pîrsiyarê* *gele zûde hatîbû dayîn*. Bes dîbû ku wî *bawerîya xwe* bî *vê bersiva pîroz* *baniya*. Lê *Thales* wek *momînek dini* lî *dînyayê mêze nake*, *mina mirovek zaña dîkeve dû* *vê bersivê*, *perspektiv û metodên zanîstî* *dîgîre ber* û *her bo vê jî dîghê dawiyek misbet* û *bîyarek berbiçav*. Serde ji *gele zanîyariyên hêja* bî *dest dîxe*. *Dîvê jî bir ve neçe*, *ew hin dî serdema seretayî* de ye, jî bo *ilmê felsefê* jî *hin destpêk e* û

têbîniyên wî jî *hin jî reng û motivên berê xîlas nebûne*.

Aristoteles tîlî *dîrêjî diyardeyek dînê* jî *dîke û dîbêjê*, *mîrov, dî dînyabîniya Thales* de bî *awakî vêşartî* *hebûna ramanek dîn jî dîkare bibîne*: *Tu hebûnek ji nebûnê pêyda nabe*. Lê *belê ev hebûnên cure cure bî çî awayî û çawa jî vê ewil-madê* *pêyda bûne?* *Avê çî guhartî derbas kirîne* û *çî ser de hatîne* ku *ev tîştên cîhê cîhê jî wê derketîne?* *Thales* *bersiva van pîrsiyara nade* û *dûre pêyrevên wî* bî *van meselan ve mijûl dîbin*.

ANAXIMANDROS

Anaximandros jî jî *xelkê bajarê Miletosê* ye. *Dû Thales* *re tê*. *Pêyrevê rêç* û *dînyabîniya Thalesê* ye. *Dîbêjî saeta tavê* wî *çêkîriye* û *nexşeyê(xerita)* *dînyayê* jî *ewilcar* *her wî* bî *xwe kîşandîye*. Bî *navê Peri physeos* (*dî derheqa Tebietê de*) *kitêbek nivîsiye* ku *ev nava jî bo filosofên felsefa xwezayê* *bûye adet* û *êdî wan kitêbên xwe* dî *bin vi navi* de *kom kirîne*.

Anaximandros jî *wek Thales* bî *awayê pêkhatuna kaina-tê*, *pîrsa çîti ya ewil-madê* ve *serê xwe dîşîne*. *Pêyadûn* û *pêkhatuna hebûnan girêdayî* bî *uştêk madi* an *ser bî madeyek zayîndar* *dîbine*. *Ew jî bersivên din* û *mitologiyê* *mina pîvanek nabîne*, *bala xwe nade wan*. Lê *ew, avê* an *uştêk mina wê berbiçav(concrete)* û *hîşpêkîri* *wek hoyek himdar* û *bîngehin* *na xwaze pêşniyar bîke*. Lî gor *têbîniya wî ewil-prensîp* *dîvê bêserî û bêdawi* be, ku *ev hebûnên cîhê cîhê* û *cuda cuda bîkarîbîn jê* *pêyda bîbîn*. *Ew wê bî navê Apeiron* (*bêsinor*) *pêşkeş dîke*. *Bêserî û bêdawi* *bûn ne tenê taybetiyên ewil-madê* ne, *bêsinorî* *made her bî xwe ye* jî.

Anaximandros, *pêşneyara Thales* *rast û dî cîh de nabîne*. Bo ku *tîştên hîşpêkîri* *tum diyar in*; *mîrov dîkare bî heyîya wan bîhese*. Her wîha *mîrov dîkare sinorên wan bîkîşîne* û *der û dorên wan bîbine*, *tesbît bîke* û *bîde xûyandîne*. *Ev dînya hebûnan* ku *evçend dewlemend* û *rengdar e*, jî *hebûnek wek av* û *yên dîne* -ku bî *sinor* û *diyarkîri* ne- *nîkare pêyda bibe*. *Dîvê bêserî û bêdawi* *bûn jî bo prensîbek sereki* û *uştêk zayîndar* *mina xasîyet* û *taybetiyek bîngehin* *hebe* û *tim bête hejmartî*. *Pêyv* û *meffûma bêsinorî* dî *saya xebata Anaximandros* de *ketiye felsefê*, *dewseke qayim sitandîye* û *valayiyek mezin tîjî kîriye*.

Anaximandros ji *apeironê* tabloyek calib û balkêş di derheqa xwezayê de pêk aniye. Lî gor wi, pêş her tiştî *serma* û *germa* ji *apeironê* zane û berhemên wi ne. *Germa*, mina agirek gur û geş bû; *serma* û *tari* an tiştên ku hê di serdema çêbûnê de bûn, ketin bin baskên *germiyê* û hatin helandin. Jî *sermayê* wek *rim* (avin) û *tir* (ne avin) du tiştên dijber pêyda bûn. Bo ku kela *germiyê* çarmedora dinyayê girtibû, *rim* heliya û helmên ku ji vê kelê bilind dibûn tesir li *agir* kirin û ji *agir* komikên cihê cihê pêk hatin. Ev komikên *agirin* bî kun û kunik bûn. *Tav* û *Heyvê* ew kun û kunik ji xwe re kirin rê û ji wir de *agir* dibarandin. Bî vi awayi ji *agir* û *helma* germ *hewa* pêyda bû. *Erd*, ne wek gotina *Thales* e, ew ne *pan* û *berin* e. Ew, mina sitûneke girovir û silindirik e. *Erd* naherike û di valahiyê de sekinandi ye û *ezman* di dorbera wi de digere. Dî seri de *erd* tunebû û her der *behr* bû. Jindarên ewilin mina masiyan bûn an rengê wan didan. Ew di vê behrê de pêyda bûn û jina xwe domandin. *Mirov* ji vê jindarên *masireng* pêyda bûn. Bo ku serdema zarokti ya mirov wextek dirêj divê, nebû û nedibû di destpêkê de pêyda bibe û bijî.

Belê, wek tê ditin *Anaxsimandros* ji li *ewil-madê* digere û *Apeiron* a xwe wek hebûnek *bêsinor* pêşkeş dike. Tiştê ku wi lêzêde kiriye mefhûma *bêsinori* û rê û rewşa pêydabûn a hebûnan e.



ANAXIMENES


Anaximenes xwendeyê *Anaximandros* e û mina mamosteyê xwe ew ji bî *ewil-madeyek bêsinor* digere. Lê têgihîştina mefhûma *bêsinoriyê* ya ku di serê wi de ye rengê ya mamosteyê wi nade û bî gîştî cihê ye. Ew, di vi wari de ne wek *Anaksimandros*, mina *Thales* difikre û *ewil-madeyê* ji hebûnên xûya û berbîçav diwejjine. Lî gor lêkolîn û lêhûrbûna wi *hewa* prensibek ewilîn e û gîş hebûn di demek dîr û dirêj de ji wê pêyda bûne. *Hewa* tişte herî berfireh û hêztir e. Jixwe ev دنیا di bin baskên wê de ye.

Vê têbiniya *Anaxsimenesê* bî rûxwûyani tişte nû bî xwe re neaniye; lê ji bo hinek mefhûm û peyvên nû rê vekriye. Bî wêne, li gor wi, çawa ku bedena mirov di saya *ruhê* (psykhe) de dikare jindariya xwe bîdomine û li ser piya bîmine, her tişt ji hewcedarê *hewayê* ye. Her wiha *ruh* ji ji *bêhn* û *hewayê* pêk hatiye. Pêyva *ruh* di felsefê de bermayê xebata *Anaximenes* e û sayiya wi de ketiye felsefa Yewnanê. Disa dibêje, *hewa* an *ruh* nebe bedena mirov dirize, nikare bî hevre bîmine û ji hev dikeve. Jî ber vê yekê çawa ku *hewa* nahêle bedena me pûç û belav bibe, her wiha دنیا ji gurtiye bin qefsinga xwe û rê nade ew ji hev bikeve û belavela bibe.

Ango li gor zanayê me *hewa* xwedi can e û gîş hebûn berhemên wê ne. Lî gel vê yekê di dinyabiniya *Thales* û ya *Anaxsagoras* de ji *ewil-madê* her jindar û *zayindar* e. Lê belê berhemên wê wek *bican* û *bêcan* nehatibûn beş kirin. Evçend tiştên cihê cihê çawa û bî çî *awayi* ji *mada-ewil* bî derketne?

Anaximenes bî van pirsiyaran ve mijûl bûye û têbiniyên xwe ji diyar kirine: Jî ber *sistbûn* û *şidaniya* hewayê gele tiştên cure cure pêyda bûne. Ango bî vi awayi *hewa* hatiye guhartin û derbasi rewşek nû bûye û hebûnen cîda cîda gav bî gav ji wê peyda bûne. *Hewa* ku siviya û ji hev ket *agir* jê pêyda bû an bû *agir*. Dî rewşa tiri û şidani de ji *ba* û *ewir* jê çê bûn. Jî ewran *av*, ji avê *erd*, ku bêtir tir bû *zinar* û *kevîr* derketin holê. Bî vi awayi wek *rim* û *tir* û *agir* sê halên *madeyê* peyda bûn. Riş û binyata van hebûnên reng bî reng diçe dighê *mada-ewil*. Wek hatiye diyar kirin jixwe ew ji wek *xwe* û serbixwe ye û tucar naverok û hebûna wê ji nav de ranabe.

Wek tê ditin *Anaximenes*, *hewayê* an hebûnek wisa madi wek bîngeh û *ewil prensip* pêşkeş dike. Bî vê ve na-



Kontrastên Anaksimandrosê û kirîşên şıdandiyên Pythagoras dıçın dıghên dınyabıniya Herakleitos:

*Ne yayên şıdandi yê dijber, wek kewanek bı harmoni.
(Çavkani: Bertrand Russell, Felsefe ya Roava, bı Swêdi)*

mine û serde ji her rewş û rêveva pêydabûn û guhartinê' ji eşkera dıke. Jı mırına wi pêde *Dıbıstana Miletê* dı qada felsefê de rol û giringiya xwe wında kiriye. Lê belê têbiniyên her sê filosofên wê dibıstanê jı bo felsefa wêbêyê

wek kevıra qorê dı cihê xwe de man; nırx û rûmeta xwe parastın û her dıparêzın.

HERAKLEITOS

Herakleitos ji mina yê berê dı navça *Ionia* û *Ephesosê* de jına xwe biriye seri. Lı gor texminên diroknasana dı navbera salên 540-480 PZ de emra xwe teva kiriye. Ser bı malbatek aristokrat e û ev rewşa cıvaki mina diyardeyek (fenomen) giringiya rola xwe dı jin û pêkhatına ditın û dınya-bini ya wi de dıde xûyan.

Jı berhema wi ya navdar, jı *Dı Derheqa Kainatê* tenê qasi 330 letletên kurt gıhiştine serdema me. Kıtêba wi ne zêde zelal û ronı ye û bı zımanek gıran û nevekırı hatiye nıvisandinê. Bona vê zanayên berê sedem bı vê rewşê wi re dibêjin *Herakleitosê tari*. Dıbe ku ev bınavkırına nexweş ne tenê jı zımanê pırtûka wi hatıbe pêş, ên ku jı awayê jına wi û jı kar û xebata wi kêfxweş nebûne û dijberên têbiniyên wi bûne rewş û tewrên xwe bı vi toreyi eşkera kırıbin. Bo ku dı serdema wi de êdi aristokrasiya Yewnanê jı hukum ketubû. Ên ku dı çavê wi de xwedı rêz û rûmet bûn, kar û barê surandına dewletê bı tenê wan dıkarı binın cih, dı vê rewşa nû de, gele paşde mabûn û demokrasiya Yewnanê zererek mezın dabû aristokrasiyê. *Herakleitos* jı vê bûyer û rewşa sıyası ya Yewnanê gele nerehet bûye. Jı ber vê yekê mina mırovek xeyidi dest jı cımaetê kışandıye û kışıye mala xwe. Qasi ku têgotinê jı pıraniya komelê an jı beşên ne aristokrat tıcar kêfxweş nebûye, ew tım nızm û bıçûk, wek nezan û aqılsıvık ditıne, dı jına xwe de rû û rûmet nedaye wan. Her sıya vê tewra wi ya nexweş dı dınyabıniya wi de jı xwe dıde xwûyanê.

Herakleitos jı wek filosofên beriya xwe, bı pırsa pêydabûn û pêkhatına kainatê ve mijûl bûye. Ew jı *agir* wek *ewıl-made* pêşniyar dıke û gış hebûnan lı gor rewşa *agirê* û guhartınên wi diyar dıke. Dı navbera têbini yê wi û yê filosofên beriya wi de cıdatiyên kûr û berin nayên ditın. Çı heye ku ew dı gele cih û dewsan de bir û ramanên yekser balkêş dıefrine û bı awaki *dialektiki* rêrev û rêbazên guheran ên hebûnê dıxe pêş.

Dı dınyabıniyên filosof ên beriya *Herakleitosê* de, *ewıl-made* bıgeha gış hebûnan bû; lê ew bı xwe tıcar nedıhate guhartınê û her û her mina xwe dımiya. Lê belê, *Herakleitos* diyar dıke ku *ewıl-made* jı *tım dı rewşa herikınê* de ye

û diguhure. Tucar wek xwe û xwe bi xwe namine û newesta ye. Kainat û gîş hebûn, tum dî rewşa herikin û guheranê de ne. Ev, zagonek bêserî û bêsinor e (*bê serî û bê dawî*) û gîş hebûn û ewil-made dî vê rewşa bingehin de ji halek derbasi halek din dibin.

Herakleitos, bî eşkera, heyî û efranerîya Xwedê red dîke û wiha dimvise:

Dinya hebûnek serbixwe ye, ew ne berhema efranerî ya Xwedê û ne ji ya mirova ne. Ew, mina agirek gur u gêş bêserî û bêsinor e. Agir li gor zagonek vêdikeve û li gor zagonek dinê ditemure.

B1 wêne êzîngêk (darê şewitandinê) hîşk û agirpêket, dî demek de rewşa xwe diguhurine: Çik jê derdikevîn, dî jê radibe û ku şevitîn qedîya dî cih de tenê xweli û kêmek ji komir dimine. B1 vi awayî dar ji holê radibe an diguhure û dibe tîştên din. Gîş hebûn û kainat ji her wisa dî rewşa guheranê û herikinê de ne. Ev zagonek berdewam û neseqinî ye. Lê dîsan ji kainat her heye û tucar wînda nabe. Herakleitos, heyîya hebûnan girêdayî bî dijberîya nav dijan û ya şerê navbera wan dibîne û wiha pêde diçe:

Gîş heyî û neyî, bîserxweyî û dualîtî, lihevkarî û lihevneynî, ji gîşkan yek tîşt û ji yekî her tîşt...

D1 vê rewşa dijberî, herikin û guheran a bêserî û bêdawî de erd û ezman an kainat çawa her û her heyîya xwe diparêze? Ev xweragirtin ser bî çî qanûn û rêbazek taybetî ye? Herakleitos dînyayê wek yekî û tevayî ya dijan dibîne û dîde nasandî. Heke ev dijberî nebe tu tîşt naguhure û ji halek derbasi halek dinê nabe. Şer û guheran berhemên peywendiyên navbera wan dijan nîn. Her wiha herikin (hereket) ji daxûyana vê rewşê ye û gîş hebûn her tum dî rewşa herikandinê de dijin. B1 gotinek dinê, herikin, mefhûmek bêsinor û bêdawî ye. Herakleitos zagona vê rûdayê ji diyar dîke:

Logos, dî gîş mirovan de û dî her cih de xwe dîde xûyan û hevbeş e. Divê ku mirov li gor vê logosa hevbeş bumeşîn. Lê logos her çiqas tîstek hevbeş be ji mirov wisa dîzanî ku her yek xwedî bir û ramanek taybetî ne û ji ber vê yekê her mirovek bê qeyd û bê şert li gor dilê xwe jîna xwe dumeşîne. Çawa ku komirê davêjin nav agirê bî rengêk guhartî dişewite û ku ji agir kîşandin dîsa dibe komira reş, mina wê mirov ji heya ku li gor vê hevbeşiyê meşîyan ji logosê para xwe dîstinî; heke dî wi nekevî û dî neçîn bêpar dîmunî.

Logos, dî dinyabîniya Herakleitosê de têgîhek

(mefhûmek) bingehin e û xwedî cih û rolek bêtur gîring e. Ev tîgîh (mefhûm) an zagonek wisa ye ku gîş hebûn û rewş û mercên ku hebûn têde ne, bûyerên civakî û yê xwezayê gîş dî bin pêşengîya wî de (*Logos*) heyîya xwe diparêzî. Ku logos nebe erd û ezman nîkare heyî û yekîtiya xwe biparêze û bîdomîne.

Herakleitos, şerê navbera hebûnan, wek rûda û bûyerek himdar pêşkeş dîke. Ev dî dinyabîniya wî de xwedî manayek fireh û rûmetek mezin e. B1 wêne, gîş guheran an ji rewşek derbasi rewşek din çûn her şer e û bê şer ev rûda û bûyer pêk nayên:

Şer bavê her tîştî ye. Divê bête zanî ku ev ji bo gîştîyan e û hevbeş e. Her tîşt li gor şer û pêwîstiyê ye. Ev bûyin (genesis) daxûyanek pêwîst e û jîxwe kainat dî saya vê pêwîstiyê de yekîtiya xwe diparêze. Dijberî mina du rûyên mîdalê ye. J1 ber vê yekê ew her şertek sereki yê yekîtiyê ye jî:

Mirî û jînde, hîşyar û xwewdeyî, pîr û xort, her yek in. Bo ku ew, bî rîya guhartî ve dîkevî dewsa yek û du. Sar dibe germ û germ jî dibe sar, ter dibe hîşk û hîşk jî dibe ter.

Ev rûdayên wiha gîş berhemên agirê ne. Ango gîş hebûn, cure cure xûyan û ji rengêk derbasi rengêk dinê bûna agirê ne:

Erd û ezman jî agirê pêk hatîne, ew agirek jînde ye û her wê wisa bîmine.

B1 vê gotinê xwe Herakleitos eşkera dîke ku agir wek ewil-made her û her diguhure û hebûnek xwedî jî e. Tu tîşt dî rewş û mercên zeman û mekanê de wek xwe namîne; dî rewşa herikinê (*Panta rei*) de ye û tum diguhure. Dibe tîstek din an derbasi rewşek nû dibe. Bona vê yekê Tav her nû ye û Mirov ducar serhev de nîkare jî ava çemek derbaz be. Bo ku ava çem nîkare wek xwe bîmine û ava xwe her û her dî cih de bîhêle. Tum dî rewşa herikanê de ye û ava ku demek berê li me ket û em bî heyîya wê hesîyan û me hîşpêkir herikî çû. Bo ku ava berê derbaz bû çû, divê ajnewan hercar bikeve avek nû. Bo ku her navê çemê dî cih de maye, lê ava wî serhev de tere, dîherike û diguhure.

Herakleitos dibêje, J1 bo mirovên hîşyar tenê yek dînya heye. Lê gîş nîkarî vê hebûnê bî awakî rîkûpêk bînasî û bî awakî rast bî rewşa wê bîghên. Hebûn tucar jî herikinê dîr nakeve û pêyda nabe. J1 ber ku ew naverok û rûdayê hebûnê ye. Vê rastiyê tenê û tenê mirovên zana dîkarî bîbinî û tîbîghên. Yê nezan û ne hîşyar bî daxûyanî û

formên hebûnê ve xwe diwestinin û her tım xwe dilêbinin. Û wisa pêde dıçe:

Ava behrê him xweş e û him ne xweş e. Masi vedıxwûn û saya wê de jina xwe didominin. Ji bo mirovan ji avek ne xweş e û kuştar e. Ka kêri kerê tê, ne zêr; beraz ne ji ava zelal û pak, ji hezazê kêfxweş dıbin; ga ku colbikan dıbinin gele bextewar dıbin; mur û murîşk ji di tozê de digewızın. Mirovên gêj û bêhuş humber logosê de her şaş û mat in. Seg li mirovên nenas dirên.

Diyar e ku *Herakleitos* mirovan dike du beş: *Zana û nezana*. Dı serdema wi de *zana* û hişyar her aristokrat bûn. Ev taybetiyên ku ew ji bo têgihştına kainatê û sûrina kar û barê komelê wek mercek pêwist pêşniyar dike, tenê di destê aristokrasiyê de bûn. Wisa dıxûyê ku *Herakleitos* hember rewşa siyasi ya wi demi nerehetiya xwe bı vê têbiniya xwe ve eşkera dike, Aligiri û arikariya aristokrasiyê diwejine.

Herakleitos, dı Felsefa Rojavayê de wek ewıl zanayek gele heja tete nasin. Dınyabiniya wi li gor rewş û dınyabiniyên wê serdemê gele têkuztur û rengdar e. Her wiha bı awaki zanisti li hebûnê nihêriye û bûye himdarê felsefa *dialektik*. Hezaran sale ku raman û têbiniyên wi her nırx û qimeta xwe dıparêzin û ji bo ber û neslên paşê ji her rêberi dıkin. Zanistên hevdem û nûjen gele tıştên xwe ji dınyabiniya wi distinin û dêyndarên xebata wi ne. *Felsefa dialektiki û materialisma tarixi*, *Herakleitosê* mezin wek himdarê xwe dihesibine. *Herakleitos* dibêje:

Tu tışt di dewsa xwe de û wek xwe namine. Yên ku car car dikevin ava çemek, hercar bı avên cihê cihê ve rûbirû dıbin. Hum ketine ava çemek û hum neketine; hum yê keti em in û hum ne em in.

XENOPHANES

Xenophanes, hevdemê *Herakleitos* e. Dı navbera salên 569-477ê PZ de jiyaye. Ew ji Kolophonê ye, ku dikeve mabeyna İzmirê û Efes a iroyini. Hê ku 25 salı bûye wela-tê xwe cihıştiye û çûye İtalia Başûr û jina xwe dı wir de birıye seri. Ji kitêba wi birek gele kurt gihaye iro û mıxabin beşa mezin wında bûye. Qasi ku ji bermayiyên nıvisar ên wi derdıkeve, ew ji filosof bûnê pêde mina za-

nayek dini dıxûye. Têbiniyên wi dı warê dınyabiniya dini de xwedi nırx û taybetiyên gele balkêş in. Serdema *Zêdexwedêyi* (Politeizm) de *Xwedêyên* cımaetê mina mirovan xwedi jin û can bûn. Kerba wan ku radıbû dı nav xwe de şer dıkirın, xwin dırijandın û carna aşiti û teqewestan çêdibûn dı navbera wan de... Dı rewşek aloz û tewlıhev de dıjiyan û wek mirovên xêrnexwaz pırcar dıjminatıya hev dıkirın û hevrikê hev bûn. *Xenophanes*, humberi vê rewşa nexweş sekniya. Kesên ku *Xwedan* bı vi awayi dızanın û dıdın nasandınê, rexne li wan dıgirt û wiha dıgot:

Homeros û Hesiodos, dı navbera mirovên miri de, wek *xırabiyê û şermezariyê* çı tışt ku hebûne, ew gış *xıstine* li ser milê *Xwedan*. *Xwedê* dıziyê dıkin, derewa *dıbêjin* û *jinên* xwe dilêbinin. Ji ber vê *yekê* mirov wisa *têdighên* ku *Xwedê* ji mina wan ji *dayikan* zane, mina wan *kınc* û *kolan* li xwe dıkin û her xwe dı bin şıklê mirovan de *didın* *xwûyanê*. Bı vi *sedemi Habeşi*, *xwedêyên* xwe wek xwe *pozreş* û *bejndırêj*; *Traki*, *porzer* û *çavşın* dızanın. *Heke* wisa *bûya* û *hesp* û *şêr* ku *xwedi* *destan* *bûna* û *bıkarıba* *resm çêbıkıra*; *hespan* *xwedêyên* xwe *mina* *hesp*, *şêran* *ji yên* xwe *mina* xwe *çêdıkırın*. Dı *rastiyê* de *Xwedê* ne *şêr* in ne *ji hesp* in. *Her çawa* ku dı *hêkelên* *Yewnanê* de *dane xûyandınê* ew ne *ji mirov* in.

Çı heye ku *Xenophanes* bı vê gotına xwe ji *rastiyê* dır dikeve û dikeve ser şopa şaşıyê. Bo ku mirov, ji seri heya dawiyê li *pêydabûn* û *pêşdeçûna* raman a *bı xwedê* *baweriyê* *dınhêre*, bı awaki *zelal* *dıkare* *bıbine* ku ev *tıştên* wisa *berhemên* *jina* *mırovıyê* ne û li gor *ditın* û *şıro* *vekirına* *mırovan* *hatne* *efırandınê*. Ka *mırov* ku *nebûnan* û li gor *ditın* û *hewceyiyên* xwe *serê* xwe bı *rûda* û *bûyerên* *kainatê* ve *neêşandana*, wê *Xwedêyên* *cure* *cure* *çawa* *bıhatana* *efırandınê*? Lê belê, *zanayê* me *ji xwedêyên* *bêhêz* an *kêmhêz* ne *rehet* e. Li *xû* û *xasıyetên* wan *dınhêre*, *rewş* û *dezza* *geha* wan *dıgire* *berçav*, *zeaf* û *kêmasiyên* wan *dınırxinê*, bı her awayi *qayılıya* xwe bı wan *re* *diyar* *nake*. *Vêga* ew *ji dikeve* *pêyi* *xiyalek* wisa ku *divê* *Xwedêyek* *hêztırın* û *bêwêne* *bıefrine*. *Xenophanes* *ji vê* *seregêjıyê* dı *sayıya* *vê* *ramana* xwe de *rızgar* *dıbe*:

Xwedê *yek* e. *Ew* *serbilınd* û *serefırazê* *Xwedan* û *mırovan* e. *Ne* *bı şıklê* *xwe* û *ne* *ji* *bı ramandariya* *xwe* *tucar* *neçûye* *mırov* û *rengê* *mırovan* *nade*. *Xwedê* *ditınek* *teva* û *ronak*, *pêhesınek* *paqıj* û *hızırandınek* *zelal* e. *Û* *gış* *hebûnan* *lı* *gor* *dıl* *û* *ramana* *xwe* *bı* *bêzehmeti* *û* *bı* *hêsaniyê* *dısûrine*.

Dı dınyabiniya *Xenophanes* de *tıştê* ku *nûh* û *balkêş* e,

ramana *yekxwedêyi* ye. Dî demên paşiyê de ev fikra bêtur geş dibe û riş davêje. Wisa têxûyan ku *Sokrates* û *Platon* ji dî bîn tesira vê fikra *yekxwedêyi* de diminin. Ev herdu filosof ji dijberê *anthropomorphizmê* ne û parêzgariya *Xwedêyek muceret* dîkin. Bî hoya vê ditnê ve *Xenophanes* dî felsefa Antik a *Yewnanê* de wek himdarê vê rêçê tete hesabandin.

PARMENIDES

Parmenides ji *Eleayê* ye û lî gor gotinan dî 540'ê PZ de ji diya xwe bûye. Dî welatê xwe de kar û barê dewletê de ji beşdar bûye û mîna *qanûnzane* mezûn xwedî nav û deng bûye.

Ew ji wek pêşengê xwe *Xenophanes* bir û baweriya *yekxwedêtiyê* diparêze. Gîş nihêrin û têtîniyên wi her ber bî vê mebestê dîçin. Lê ew bo ku bîkaribe vê ramana xwe bî awaki aqli pêşkeş bike *têoriya zanistê* digire pêş û ji her tûştî bêtur bî pîrsa *zanînê* ve mijûl dibe. Zanin çî ye û zaniyariyên mîrov ji ku tîn? Rasti û şaşî bî çî awayî tîn nîrxandin? Ev pîrsiyarên bîngêhin bibe nebe pîrsa *hebûnê* derdixin pêş û divê ka ew çî ye mîrov serê xwe bî bersiva wê ve biêşîne.

Wek mefhûm û pêyvek serbixwe *hebûn* (Being) ewilcar dî xebata *Parmenides* de xwe dîde xwûyan. Lî gor wi hunek zaniyariyên mîrovan hene ku ew yek bî yek berhemên hebûnan in. Em, *bûyin* (genesis) û bûyer û hebûnan dî saya heskarên xwe de nas dîkin. Ango bî vê rê ve em dîkarin *haya* wan bîkin. Ev zaniyariyên ku em ji hebûnên cihê cihê û tevlihev bî dest dîxin, tucar ne rast in û em xwe bî rastiya wan ve tîm dîxapînin. Jî ber ku zaniyariyên ku bî riya heskarên xwe ve em bî dest dîxin, an yê ku berhemên heskaran in rê nadî mîrov zaniyariyên rast bî dest bîxe û me tîm dî şaşiyê de dîhêlin. Em, bî arikariya heskarên xwe tenê tûştî ku mîrov bî arikariya pênc heskarên xwe ve pêdîhese, tenê dîkarin wan bînasîn. Lê belê *ce-wher* (essence) û *naveroka* hebûnan bî arikariya heskaran ve nayê nasîn. Bî minaki em gulilkek sîpi, kevîrek sîpi an bîxokek sîpi bî riya heskarên xwe ve nas dîkin. Lê ev *sîpi* bî xwe çî ye, em nîkarin pê bînasîn û wek zaniyariyek haypêkîrî pê bîzanîn. Çawa ku dî vê minakiyê de ji dîxûye, jî hebûnên pêhesinê pêde hebûnek taybetî heye û

ev heyîya xwe dî gîş hebûnan de dîde xûyanê. Lê ew bî xwe tucar nayê ditin. *Hebûn* her mîna *sîpi* ye û mîrov bî riya heskarên xwe ve nîkarê bî heyîya wê bîhese û wê nasbîke. Ew tenê bî arikariya *bir* ve têt zanîn.

Bî vi awayî *Parmenides*, *hebûn* a xwe dîxe dewsa *Xwedê* yê mamostayê xwe *Xenophanesê*. Diyar e dî vîr de *Parmenides*, zanînê û zaniyariyê dîke du beş: *rast* (*aletheia*) û *derewin* (*doxa*). Ango tenê *bir* dîkare zaniyariyên rast bî dest bîxe. Mîrov bî riya heskarên xwe ve nîkare rastiye pêyda bîke; bî zaniyariyên ser bî heskaran tîm xwe dîlêbine. Bî vê rêve xwe ve *Parmenides*, prensîba duwemin a *metafizik* û *idealizmê* pêşkeş dîke ku wê, heya serdema me dî bîn rengên cihê cihê de heyîya xwe domandiye.

Filosofên berê *zanînê* beşbeş nakîn û ji hev naqetînin û sinorek tuj û hîşk nav de nakîşînin. Hebûne û kainatê lî gor lînihêrin û ramanên xwe şîro vedîkin. Lê *Parmenides* êdî ji vê xetê dîkeve û bî awaki muceret lî hebûnê mîze dîke. Ê tenê giraniyê dîde *yek hebûnê* û jî bo qane kîrîna vê ditna xwe ji grîngî û pêşdeyîyê dîde *bir*. Ew dî kîtêba xwe ya *Dî Derheqa Aletheia û Doxayê de* fantazyên gele rengî ji pêşkeş dîke: *Keçikên Tavê* dîkevîm pêşîya filosof û wi dîbîm cem *Xwedê ya Hertuştzan*. *Xwedêya Hertuştzan*, dî warê rê û şopa zanatiyê de şîreta bî filosof re dîke û ew ji mîna *Parmenidesê*, rastiye mîna berhemek aqlê û şaşiyê ji wek berhemên heskaran dîferme.

Lî gel vê yekê *Parmenides* bî van bir û baweriyên xwe ve dîji *Herakleitos* derdîkeve û dîbe dijberê felsefe ya wi. Bo ku *Herakleitos* tu hebûnek bê herîkandin û guheranê nafîkre û sîxletî û tewliheviyê red nake. Dînya *Parmenides* gele aram û serwest e; lê her û her tenê heskarên mîrov rê vedîkin jî bo aloziyê.

ZENON

Zenon ji ser bî *Dîbîstana Eleayê* ye û bî texmîni dî navbera salên 490-430'ê PZ de jîna xwe bîriye seri. Ew dijberê *Dîbîstana Ioniayê* ye û *geleyi* û *herîkinê* napejîre. Ew dînyabîniya xwe lî gor zaniyariyên cerbî (experimental) û nihêrîni ava nake û xasîma bî bêje û peyvên zîman ve mijûl dîbe û têtîniyên xwe lî gor vê xebata xwe pêk tîne. Jî ber vê yekê *têoriya* wi gele sist û bêçîne ye û jî alî filosofên dîn ve bî hêsani hatiye pûç kîrîn.

Mîrov ku *geleyi* an *pîraniyê* bîpejîrine, divê him

hebûnên biçûk him ji yê mezûn tum bigire berçav û di warê çendiyê de tu sinorek nekîşîne pêşiya wan. Ango mirov ku dest bî letlet kîrîna hebûne bike û vê xebata xwe heya dawiyê bibe, êdî dîghê encamek wîsa ku nikare hebûna mayî perçe bike. Her wîha, di vi qonaxî de, vêga dest bî civandîna wan letukan bike, nikare hebûnek mezûn an hebûnek gîştî an ji hebûna ku di serî de pê mijûl bûbû disa bî dest bine. Bo ku letlet kîrînê dî gîhabû qonaxek wîsan ku hebûna lî berdestmayî nedîhate dabeşkirin. Heke tîbîniya *Dîbîstana Ioniayê* bîpejîrînin an geleyî ya hebûnan wek prensîbek bigîrin pêş, divê di vi warî de tû sinorek daneynî û *bêserî û bêdawî* bûna hebûna rengdar dê qîbûl bikin. Bo ku her hebûnek hevîsinorê hebûnek dîn e û sinorên her yekî bî ya dînê ve girêdayîye û di saya wê de tê diyar kîrîn... Ev rewşa hebûnan bî vi awayî her dom dîke. *Zenon* dibêje, carek ku em bîbêjin *Her tîşt di mekanek de ciwar dibe* êdî nikarin pêşiya vê *şasiyê* bigîrin: Bo ku her mekan di nava mekanek dîn de ye û ev rewşa han bî heya dawiyê heya xwe didomîne. Jî ber vê hoyê *Zenon* fîkra geleyîya *hebûnê* red dîke.

Zenon, herîkin jî naparêze. Qasî ku *Aristoteles* neqil dîke, qaneyên ku di vi warî de *Zenon*-xasîma hevparê wî *Akhileus*- derdixê pêş ev in: *Akhileus* û kîsa pîyhev bî rê dîkevin. Kîsa, demek berîya *Akhileus* bî rê ketîye û di nê *Akhileus* xwe nagîne *Kisayê*. Bo ku di destpêkê de rîya ku kîsayê qat kîrîye *Akhileus* diçe-naçe êdî nikare vê navbeynê bîqedîne û bîghê *Kisayê*. Rîya ku hê *Akhiles* dest pênekîrîbû û di vi demî de *Kisayê* gîrtûbû, di viya ku *Akhileus* pêşde wê bîqedîne. Helbet di vi demî de *Kîsa* bîbe-nebe *Kîsa* beşek dîn ê rê jî diqedîne... Û ev rewşa her dom dîke û *Akhileus* tucar nikare xwe bigeyne *Kisayê*.

Lî gor qaneyek dîn ê *Zenon* jî: *Bezayek*, tucar nikare heya dawîya pist a *bezanê* bîbeze. Bo ku beza, ewilgav divê niviyê rê bîbeze bîqedîne; pêş niviyê rê divê niviyê nivî ya wê; pêş niviyê nivî divê niviyê nivî yê nivî... bîbeze û bîqedîne. Ev tucar naqede û beza nikare bîghê dawîya pistê.

Zenon, jî bo îspat kîrîna tîoriya xwe gele minakîyên dîn jî pêşkeş dîke. Wek tê ditin ew dev jî bûyerên berçav û nihêrînên cerbî berdîde û tenê bîjeyên zuman digire pêş û wan jî bo serastkîrîna tîbîni yê xwe bî kar tîne. Dîghê ramanên wîsa ku jî bûyerîya hebûnê pîr dîr dîkeve. Ev qaneyên ku wî xîstîne pêş û xwastîye bî arîkariya wan ve xwe di şopek rast û pêbawer de bîde xûyan, jî aliyê *Aristoteles* û gele zanayên dîn ve bî hîsani hatîne pûç kîrîn.

Aristoteles dibêje:

*Mîrov dikare zeman û valayiyê, wek îmkanek heya dawiyê letlet bike. Lê di rastiyê (energeia) de tucar nehatiye perçe kîrînê. Heke ev sinorên ku danîne pêşiya *Akhileus* ku jî holê bî rakîrîn *Akhileus* dikare bî hîsani xwe bîghîne *Kisayê*.*

Hegel jî di kitêba xwe ya *Dersên Dîroka Felsefê* de bersîva *Aristoteles* dîpejîrîne û wîha dînivîse:

Ev bersîva rast e û gîşt tîştên pêwîst di naveroka xwe de dîcivîne... Mîrov ku behsa herîkinê dîke bî gîştî wîha dîfîkîre: Tîşt (cîsm) di cîhek de rawestayê û paşê jî wîr diçe cîhek dînê. Tîşt ku dest bî herîkinê dîke êdî ne di cîhê xwe yê berê de ye, lê belê hê negîhîştîye cîhê xwe yê duwemî jî. Heke jî wan herdu cîhan yekî de bûya, ew dê rabîwestaya. Ku bîbêjin cîsm di navbeyna herdu cîhan de di cîhek dîn de ye, jî vê gotîna wîsa tu tîstek manadar sadîr nabe. Bo ku cîsm di navbeyna wan herdu cîhan de disa di cîhek de ye. Bî vi awayî mîrov disa dîkeve astengîyek gîrtî. Herîkin ev e ku tîstek dîherîke, him di cîhek de ye û him tu cîhek diyar de nîne. Ev, jî domî û nebîrîbûna herîkinê û valayiyê tê. Ku jî xwe herîkin jî wek delîveyek (fîrsendek) jî vê rewşê derdîkeve holê... Yê ku di vi warî de dîkeve şasiyê her fîkîrkîrîn bî xwe ye. Jî ber ku di vir de fîkir, tîştên ku di rastiyê de jî hev naqetî û neqetîne, wan jî hev diqetîne û cîda dîdexûyanê.

Lenin jî di *Defterên Felsefê* de gotîna *Hegelê* dîpejîrîne û wîha dînivîse:

Tîştê ku di rewşa domiyê û ranewestîne de ye, ku di cîhek de meşa wî neyê birin û bûyerên bûyî ku neyên besîtkîrîn, leîletkîrîn, qebekîrîn û bêrîh û bêcan negîrîn berçav, mîrov nikare di derheqa bîzavê de bîfîkre, lî ser çarçova wê bîhîzîre, wê bîpîve û bîne zîmên û bîdexûyan. Her wîha bo ku mîrov bîkare herîkinê di sethê fîkrî de bîne zîmên, tum divê wê qebe bike û wek tîstek bîjî bîhesîbîne; ne tenê di sethê fîkrî de her jî bo hîspêkîrînê jî rewş wîsa ye. Ev, ne tenê jî bo herîkinê her jî bo mefîhûmên dîn jî rast e. Jî xwe naveroka dîalektîkê jî di vê nîqetê de xwe eşkera dîke: Yekîtiya dîjan.

Çawa ku di gotîna *Lenin* de jî dîxûye, *Zenon* di warê dijî nava herîkinê de xwedî rêbazek rast e; lê belê di warê pîyadabûnê û daxûyan a herîkinê de, rola ku jî hebûna dîjan tê pêş, nabîne û tînegê. Jî ber vê yekê pesna herîkinê nade.

Lawıkanê Dêrsımı de Wezn u Aheng

Mustafa Düzgün

Reyê ke Kırmancki (Dımılı, Zazaki) zonode melodiweş o, puxtek u ahengdar o. Qeseyi zaf rey ebe herfanê vengını qedinê. Qafiya vırastene u qese pêser ardene na zon de xêlê xêlê hêsan ê. Mesela *Lawıka Laçi* ra nimuneyê bijême:

Wela wela yaman o

*Ordi gurlax amo dormê ma qapan o
Bextê Heyder u Demeni rê kes xirave
nêvano*

*Ordiyê Turki zaf o cayê welaxê ma
nêdano*

*Ma zuvini qırrkeme, Çemê Muziri
cendeg u lesu ano*

*Ondêri de dame pêro tede şın u şıwan
o*

Qeseyê ke peyniya çeküyan de ebe rengo şıya diyar kerdê ne teyna hetê pirtukanê (hece) peyi ra, hama her het ra ahengdar ê. Xora jê *o* ebe herfa vengın qedinê. Na xusus hem hetê şiere nustene ra u hewes kedena şier nustene ra, hem hetê wezdayine u qese dani ye ra qeweta zoni diyar keno.

Numunewode bin:

*Ordi amo natê çemi dotê çemi
Damepêro, kışeme hêfê kami
Munzir delxe dano sade goni
Birayê mi serva Dêrsımı sero*

Na lawıka *Ismayili* de ki dezga ahengi rınd vırajıya. Corde hire çekü zuvini

de ahengdar ê, hama çeküya çarênê seke ciya vındena. Hama mordem ke diqet keno, vineno ke aheng wertê çeküyanê peyênan ê hurdemêna çarino (kıta) der o. Wertê çeküyanê *Panime hata ke ro ma der o/Birayê mi serva Dêrsımı sero*.

Lawikê Dêrsımı ebe pêm(weznê)'o serbest nuşiyê. Ne pêmê pirtıkın (weznê hece), ne pêmê aruji yeno di yene. Hama na bêwezniye ahengê lawıkanê Dêrsımı sist nêkena u nêfina hawa tekstê bê wezni. Çı ke Kırmancki hetê ahengi ra zaf zaf derwleti yo.

Mordem ke ahengê wertê çeküyan de niyadano, dezga qafiya rınd vineno. İyê ke jêde yenê diyene niya rê:

..... a a
..... a b
..... a c
..... a a
..... a	
..... b	
..... b	

Se ke zaf lawıkanê na Dêrsımı de ki rınd aseno, jê çarên (kıta) u bêyite (dı çekü) tayê cayê şiere zaf senik diyinê. Sair çeküyanê lawıka xo nêmareno, o qesa xo u vatena zerrê xo de niyadano; zu ki hetê ahengi ra diqet keno. Ca u birrê şiere *tawê* vatene de u *torê* vatişi ra vecinê. Geganê lawikê de çond cayi benê, hama dergiya na cawo (yanê

çiqayıya çeküyan) zuvini ra ferq kena. Tayê kılın, tayê tenêna derg u tayê ki zaf kılınê. Zu ki mavênê dı çeküyê qafiyeyin de gegane xêlê qesey vênên ra. Coka ma nustena na lawıkan de qafiya esas gurete u qesê wertê dı qafiyan jê jü çeküye hasavnê u heni nusnê.

Heqa ahengê na lawıkan de gere, *kemera qori* xovira nêkeme. Na qesa literaturê sarê bini de esta-çına pê nêzonen, hama ma de esta. Ostayi tawo ke dês nanêro, kemerêda xu ya birnayiye benê kose de nanêro u kemeranê bini têde hiza aye de nanêro sonê. Na kemerê rê vanê *kemera qori*. Lawıkanê Dêrsımı de sair qesade xu ya rinde serê her birri de nano ro u indi qafiya xo gorê aye vırazeno. Misalê na mesela zaf ê, hama lawıka *Xelil Begê Fême* misalode rınd teşkil kena. Hala na parçe de niyadê:

*Fêma Fêma Xelil Begê mi hêni yo
Ostorê Xelil Begê mi nawo yeno
şiwariyê seri sero niyo
Ostor, şiwariyê serê ku yo?
Va ke "Çê Miri de meser biyo"
De Mire Mire adır (e)de çê to kuyo
Qemişiye ro Xelil Begê mi meke
misayivê tû yo
Axirê wertê suma de iqrarê Eli yo
Adirê Oli de çê Miri kuyo*

Na parçe de kemera qori *hêni yo*. Qafiya corde hata cêr na qesa *hêni yo* ra gore *mizan* kerda. Qeseyê ke jê kemera qori serê parçê lawıkan de nînêro, ine ra tayê nayê:

Hiri, raye, cado (*cade wo* ra biyo kılın), weke, şüye, gavan o, kemer u ris o, kaşi, vaye, tûye, viyale, kare...

Na çond vatene musnenê ma ke lawikê Dêrsımı hetê aheng u sinetanê edebi ra dewleti yê. Çihêf ke hata nıka sero kar nêbiyo u kar hona tern u teze o.

BERHEM

Atatürk Bulvarı, Sanlıhan 105/907
KIZILAY/ANKARA

Kotkag. 15, 6 tr.
164 75 KISTA/SWEDEN



KÜRTLER

(Kaynak: A.P.LARSSON, TJUGUFEM ÅR I RYSSLAND, STOCKHOLM 1905)